

BIF

Şêwir û agahî ji bo jinan

Di van demên jêrê de hûn dikarin telefonî me bikin:

Duşem, Çarşem
13:00 heta saet 16:00

Sêşem, Pêncsem û În
9:30 heta saet 12:30

 0711 649 45 50

Heke we li derveyî van deman telefonî me kir û hejmara telefona xwe li ser mailboksê ji me re hişt, emê telefonî we bikin.

Hûn dikarin e-mailekê jî ji me re bişînin:


 bif@fhf-stuttgart.de


Şêwirmandiya me belaş e. Hûn ne mecbûr in ku navê xwe ji me re bêjin. Heke hûn bixwazin, şêwirmendî dikare li mala we jî pêk bê. Di civîna şêwirê de wergêreke jin dikare ji we re wergerîne.

Hûn dikarin bi kursiyên seqetan yên bi tekel jî derbasî odayên me yên şêwirmandiyê bibin. Eger hûn bi kursiyekî bi tekel werin cem me, beriya wê telefonî me bikin.

BIF

Şêwir û agahî ji bo jinan



 1, 9 an jî 34 heta rawestgeha Marienplatz
Ji wir derdorê 5 deqe bi meş
(Tübinger Straße, cadeya 2. milê rastê)

 xeta 43 heta rawestgeha Markuskirche



Frauen helfen Frauen e.v. Stuttgart

Beratung & Information für Frauen
Römerstraße 30
70180 Stuttgart
Tel. 0711 649 45 50
Fax 0711 60 61 56
bif@fhf-stuttgart.de
www.fhf-stuttgart.de

Gefördert durch die
**AKTION
MENSCH**

05/2021 © Fotos: Shutterstock, iStock, Adobe Stock. Die Frauen auf den Fotos sind Modelle zum Zweck der Illustration.



TUNDIYA NAV MALÊ

Agahî ji bo jinan



Frauen helfen Frauen e.v. Stuttgart



Tu jî rastî tundiya nav malê hatî?

Tu jî rastî tundiya nav malê hatî?
An jî kesekî ji derdorê te aciz dike?
An jî malbata te te tehdît dike?

Li vir tuyê bê haydarkirin ka tundiya
nav malê çi ye û li kû derê tu dikarî
alîkariyê wergirî.

Jin gellek caran li cihê lê dijîn, herwiha
di nav malbata xwe de rastî tundiye
tên. Pirraniya caran mêr tundiye
bikartînin, bo mînak hevjin, mêrên di
kampan de, an jî karmendên kampan.

Tundiya nav malê bandora xwe li
zarokên we jî dike.



Gellek rengên tundiya nav malê hene:

laşî: heke kesek te bigire, dehf bide,
bikutê, bi pîyan li te bixe an jî bixeniqîne

nefsî: heke kesek te tehdît bike an jî te
bitirsîne, gotinên nexweş ji te re bêje an jî
nefa te bişkîne

cinsî: heke kesek destê xwe bide te, bêyî
ku tu vêya bixwazî, eger destdirêjîya te
bike, an jî te mecbûrî laşfiroşiyê bike

civakî: heke kesek li te qedexe bike ku
bi malbata xwe re, an jî bi heval û dostên
xwe re bikevê têkiliyê, an jî tu bê hepskirin

aborî: heke kesek li te qedexe bike
ku tu ji kontoya malê ya hevpar pereyan
bikişînî, an jî ku kar bikî

dijîtal: heke kesek bi rêya telefona
destan an jî kompyûterê te tehdît bike,
gotinên nexweş ji te re bêje, an jî wêneyên
te nîşanî kesên din bike

Heke ku tu rastî tundiye tê, alîkariyê bixwaze!

Li navenda me ya şêwirmendiyê

... em şîret û alîkariyê dikin

... odeyek heye ku zarokên we dikarin tê
de bilîzin

... karmendên me bêyî şêwra ligel we bi
ti kesekî din re li ser wê yekê naaxivin
ka we çi gotiye

... tenê jin kar dikin

Di civîna şêwirê de

... hûn dikarin derbarê serpêhatiyên xwe
de bi me re biaxivin

... emê we agahdarî mafên we bikin

... emê rêyan nîşanî we bidin, ka çawa
hûn dikarin xwe û zarokên xwe ji
tundiye biparêzin

... emê ji we re diyar bikin, bandorên
cudabûneke ji hevjinê we li ser rewşa
we ya pênaberiyê, rewşa we ya aborî û
li ser zarokên we çi ne